Ji dê û bav û parêzgerên qanûnî
yên xwendekaranî jin û xwendekaranî zilam kû li Duisburgê dijinê, re.

Duisburg, 27.08.2021

**Pêşniyara pêkanîna derzîlêdana korona ji bo zarok û ciwanan yên 12 salî mezintir.**

Dê û bav û parêzgerên qanûnî yên xoşewîst,

ji 16ê meha Tebaxê vir ve, pisporên jin û pisporên zilam yên Komîsyona Pêkanîna Derzîlêdanê yê Domdar (STIKO) ji bo hemî zarokên kû 12 salî mezintirin jî pêkanîna derzîlêdana koronayê pêşniyar dikin. STIKO (Komîsyona Pêkanîna Derzîlêdanê yê Domdar) agahdarîyên zanyarî yên herî rojane kontrol kirîye û gihîştiye vê encamê kû, li anegorî rewşa zanebûnên heyî, avantajên pêkanîna derzîlêdanê ji hembera ji xetereya bandorên xeternok yên pêkanîna derzîlêdana yên pir kêm, pirtir in.

Hûn wekî dê û bav, heya bi temamî dawîya 15 salîya zarokê xwe, dikarin biryar bidin ka divê zarokê we were derzî kirinê, an, na. Ciwanên kû gihiştine 6 salîya xwe, edî ew dikarin bixwe biryar bidin. Pêkanîna derzîlêdanê her daîm yek biryarekê dilxwazî ye.

Zarok û ciwanên kû 12 salî mezintirin ew dikarin bi materyalê derzîlêdanê yê Biontech werin derzî kirinê.

**Çima em ji we daxwaz dikin kû hûn zarokê xwe bidin derzî kirinê?**

- Di rewşên kêmdîtî de, zarok û ciwan jî dikarin ji ber koronayê bi giranî nexweş bikevin an jî heta ji ber wê bimirin.
- Zarok û ciwan jî dikarin ji ber encamên dem dirêj yên yek nexweşîya – koronayê (Covîda Dirêj) jan bikşînin.
- Ji ber varyanta Deltayê ya vîrûsê ya nû kû bêtir vegirtî ye, xetereya nexweş ketina ji ber koronayê ji bo zarok û ciwanan pir mezintir e.
- Zarok û ciwan kû ji ber koronayê nexweş ketine, ew dikarin vê nexweşîyê derbasê kesên din bikin.
-

Encamên pandemîya koronayê ji bo zarok û ciwanan xedar in. Wek mînakî, ew ji ber dibistanên girtî, karantîna, qedexeyên pêk anîna têkiliyê, ji dûr ve fêrbûna dersê û kêmbûna çalakiyên ji bo derbas kirina demên vala, êşan dikşinîn. Ev yekê jî dikare wanan nexweş bike.

Her derzî li xwe xistin ne tenê kesê kû derzî li xwe xistîye, diparêze, lê bi taybetî di heman demê de, alîkariya parastina hemû însanên din jî dike.

- Pêkanîna derzîlêdan zarokên kû di bin 12 saliyê de ne û niha ji bo wana materyalê derzî lêdanê tune, diparêze.
- Pêk anîna derzîlêdan însanên kû nikarin derzî li xwe bidin xistinê, ew însanan
- diparêze.
- Bi saya derzî li xwe xistinê bi tevahî bi koronayê re pir kêm vegirtîyên nû pêk tên û
- kêmtir varyantên nû yên virusê kû hê bêtir derbasdar in, an jî dikarin bêtir xeternok bin, derdikevin holê.

Çiqas pirtir xwendekarên jin û xwendekarên zilam derzî li xwe bixin, di dibistanan de ew qas bêtir normalîbûn dikare were pêk anîn.

Çiqas bêtir însan derzî li xwe bixin, ewqas hindik însan nexweş dikevin û di jiyana rojane de ji bo her kesî ewqas hindik sînorkirin hewce dibe.

Ji ber vê yekê em ji we daxwaz dikin: Li cem zarokên xwe yên ji 12 salî mezintir li hember vîrûsa koronayê derzîlêdanê pêk bînin! Li Duisburgê me li gelek dibistanan de, ber bi navendên pêkanîna derzîlêdanê ve, seferên otobusan organîze kirine. Gava hûn nikaribin, ji vê vebijarkê sûd werbigirin, ji bo derzî li xwe xistinê, her roj gelek derfet têne peşkeş kirin. Li cem doktorê zarokan, hîn jî wek berê li navenda pêkanîna derzîlêdanê de, an jî li yek ji gelek kampanyayên pêkanîna derzîlêdanê yên nemerkezî de!

Heke we hîna derzî li xwe nexistibe, em ji we lezgîn daxwaz dikin kû, hûn li hembera vîrûsa koronayê derzî lêdanê pêk bînin.

**Hûn di derbarê pêkanîna derzî lêdanê – koronayê de, agahiyên rojane li Duisburg, li vir bibînin:**

Link:https://www.duisburg.de/microsites/coronavirus/aktuelles/impfung-faq_115712.php

QR-Code:

Bi slavên herî baş, û tendurist bimînin!

Di temsîliyetê de

Martin Murrack — Astrid Neese

Rêveberê Bajarê û Serokê koma krîzê — Endamê meslîsê ji bo Perwerde, Kar û Karên Civakî